

**DEPARTEMENT  
GESUNDHEIT UND SOZIALES**

Kantonaler Sozialdienst

Unterabteilung Asyl, Sektion Betreuung

17. Februar 2022

**Vîrûsa Koronayê KOVÎD-19 – Agahiyên niha**

---

Niştasihên hêja

Tûşbûna bi Koronayê kê m dibe. Pîrraniya kes an hatine vaksînekirin an jî ji nexweşiyê baş bûne û ji ber vê yekê ji pêvajoyeke dijwar a nexweşiyê tên parastin. Li gorî vê pêşketina baş, Konseya federal, biryara betalkirina beşeke zêde ya kiryarên seranserî yê Koronayê li Swîsê daye.

**Betalkirina pêwîstiya bikaranîna maskê**

Pêwîstiya bikaranîna maskê li cihê mayînê, dûkan, xwaringeh, dibistan, navendên gelemperî û cihê kar bilez hat betalkirin. Maskên paqijiyê tenê divê li wesayîten veguhestinê yê gelemperî û navendên tendurustiyê (ofîsa bijîşk, nexweşxane û hwd) bên bikaranîn.

Niştasihên ku ji ber hegerên kesane an tendurustiyê dixwazin hema wisa li cihê mayînê maskê bi kar bînin, dikarin û divê vî karî bikin. Ew her wiha dikarin maskên paqijiyê ji piştvanê xwe werbigirin.

**Betalbûna qedexetiya serdana cihê mayînê**

Qedexetiya serdanê ku ji ber belavbûna Vîrûsa Koronayê hatibû sepanandin, bilez hat rakirin. Serdana sitargehên penabertiyê ji saet 8:00 heta 22:00 dîsan rêpêdayî ye.

Her wiha ev babet tên sepanandin:

**Qerentîne di dema ku testa Koronayê pozîtîv derkeve da**

Kesên ku testa Koronaya wan pozîtîv derketiye divê herî kê m 5 rojan bikevin rewşa qerentîneyê. Eger nîşaneyên nexweşiyê diyar bibin, ji kerema xwe di gel tîma piştvanîyê bikeve têkiliyê.

**Rêzikên reftarî û kiryarên paqijiyê**

Rêzikên reftarî û paqijiyê yê naskirî (şûştina destan, parastina navbirî û hwd) hema wisa girîng in, ji ber ku Vîrûsa Koronayê hema wisa heye û dikare were veguhestin.

**Sipas**

Em ji vê yekê ku piştî derbasbûna du salan ji vê pandemiyê, derfeta rakirina van kiryanan hatiye dabînkirin, kêfxweş in. Lê hîn vîrûs ji nav neçûye. Me hemûyan hîn jî berpirsariyeke mezin derheqê xwe û kesên din heye. Loma em ji we dixwazin ku bila hûn miqate bin û rêzikên paqijiyê berçav bigirin û heke pirsgrêkeke tenddurustiyê derket, bilez piştevanan haydar bikin. Ji bo vê yekê em gelekî sipasdar in!

Di gel rêz û silavên germ

Beşa piştevaniya Penabertiyê

Stephan Müller  
Serokatiya Beşê

Marcel Thueler  
Serokê Beşa Piştevaniyê